

ASYL IN DEUTSCHLAND – Die Anhörung - Kermanci

Penaberî li Elmanya? Jêpîrsîn

Tu ji welatê xwe, ji ber şer û zordariyê reviyayî Elmanya. Li vê derê tu dikarî mafekî giring bi dest bixîni: Mafê penaberiyê. Ji bo wê pêwîste tu daxwaznameya penaberiyê li ba Dezgeha Federal ji bo Koçberiyê û Penaberan peşkêş bikî - bi kurtî jê re „BAMF“ tê gotin.

Mafê penaberiyê di bin hin mercan de tê dayîn.

BAMF dinere bê gelo daxwaznameya te ya penaberiyê van mercan pêk tîne.

Ji hêla BAMFê wê nameyeyke ji te re were, tê de civana jêpîrsîna fermî danîniye. Di guhdarîkirina li peyvên te de wê karmendekî BAMFê li çîroka te bi hûrgulî guhdar bike, agahiyên te dê parve bike û paşî biryarê bidî ka gelo te li Elmanya wekî penaber bê venasîn an na. ango ev jêpîrsîn ji bo te gelekî giring e.

Di jêpîrsînê de tu dibêjî çi bi te re li welatê te çêbûye û çima tu nema dikarîbû li wê derê bimîne. Diyar bike ku dema tu li welatê xwe vegeerî wê çi metirsî li ser te hebe. Êdî encex dema tu bi awayekî pêbawer diyar bikî ku jiber şerê li welatê te jiyana te nema bi ewle bû an jî ku tu ji ber zordariyê reviyayî, tu karibî mafê penaberiyê bidest bixîni.

Gelo sedemên zordariyê wekî çi ne?

Zordarî wê wateyê dide, ku li welatê te dewelet te naporêze, dema jiyana te dikeve bin gefan de an jî bi awayekî cuda li te dihat meyze kirin. Mirov dikevin bin zorê de ji ber ku ew ji komnetewekê ne, an ji hin ola ne, ji ber xebatên polîtîkê, ji ber rengên wan, ji ber cinsên wan, ji ber meyla cinsî.

Zordarî ji dewletê an ji hin komên din der tê. An jî ji malbatê.

Dibe ku demeke dirêj derbas be, hetanî ku çaxdema guhdarîkirina li te were, sûdê ji vê demê bike û xwe amade bike. Êdî ginring e ku hemî tiştan bi bîra xwe de bîni.

Çîroka xwe binîvisîne, ji mirovên din bipirse, ji bo rahênanê. Hetanî ku tu karibî agahiyên yek bi dîv yekê de li ser her tiştî û bi hûrgulî bidest bixîni.

Her mirovekî temengihîştî bi serê xwe tê lê guhdarî kirin. Êdî asayî ye, ji ber ku çîrok dirêj û tevlihev in. Mafê te ye ku her tiştî bibêjî, her tiştê tu giring dibîni, bêyî ku kes axaftina te bibire. Heger tu hin dane û agahiyên bi zelaî nema dikarî bîne ziman, pêwîste tu vê yekê bibêjî. Tu tiştî jiber xwe ve li ser zêde neke, bi piranî ev tê naskirin û dibe bibe sedemê nepejirandina daxwaznameya te ya penaberiyê.

Di jêpîrsînê de gelek pîrs ji mirov tên kirin, nehêle ku ev yek te têxe nava gumanan de, berî jêpîrsîna şîreta dezgehên şewirmendiyê, an jî a bervedêrekî bispor bixwaze.

Bi misogerî hemî tiştê ku çîroka te diçesipîne bi xwe re bîne: Wêne, Vîdyo, email, name, belge, raporê toxtoran, qotîkên dermanan, gotarê rojnemeyan, postê Facebook, îfadeyê dîtaran (şahidan) hwd. Heger hin belgêyên din hebin, ku dema jêpîrsîna te ne di destê te de bin, pêwîst e tu bêje ku tê paşî wan bighîne destê wan.

BAMF ji te re wergerekî deytîne.

Di guhdarîkirinê de divê tenê tiştê tu dibêjî were wergerandin. Ku tu ji wergêr fêhm nekî, an jî baweriya te pê neyê, vê yekê di dema guhdarkirinê de bibêje, heger ev yek pirr zor be jî. Tu dikarî bi xwe wergêrekî û mirovekî bi xwe re bînî. Yan jî bibêjî bê ka tu çawa hez dikî, ku karmendê guhdarîkirinê û wergerê mêr an jin be. Ev hemî divê berî civanê bi nivîskî bîn xwestin.

Guhdarîkirin bi tevahî nepenî ye. Tiştê tu bêjî çênabe derkeve derve.

Dibe ji te re zehmet be, ku tu behsa hin serpêhatiyên xerab bikî, evaya asayî ye, nehêle tu germ bibî. Tu dikarî di dema guhdarkirinê de navberan bistînin û heger pêwîst be hevpeyvînê rojeke din berdewam bikî.

Her tiştê di dema guhdarkirinê de tê gotin, di protokolekê de tê nivîsandin. Mafê te ye yekser piştî guhdarkirinê ku naveroka protokolê bê wergerandin zimanê te, ji bo tu careke din li binêre.

Her divê tu vê yekê bikî, heger şaşîti an nezelaî hebin, tu dikarî serrast bikî.

Tenê dema tu bibînî naverokê temam û rast e, imzeya xwe li rastî wê bixîne.

Protokol di orta çend heftiyên gereke ji te re di riya poste re bê. Heger nehat, pêwîst e tu lê bipirsî.

Piştî guhdarkirinê wê dîsa demek derbas bibe, dîv re wê nameyek ji te re were, tê de biryargirtina li ser daxwaznameya penaberîya te heye. Ev name girîng e, loma divê tu herdem navnîşana xwe ya nû ji BAMFê re bişînin.

Dema tu wekî penaber bê venasîn, destûra mayîna bi sînora ji te re tê.

Heger tu wekî penaber neyê nasîn, tu dikarî li dijî vê biryarê gilî bikî. Ji bo vê yekê demek pir kin bi te re heye, ew ji dema te name wergirtye dest pê dike. Loma qalîkê nameyê jî li cem xwe hilîne ji ber li ser qalîk xuyaye kengî ev name hatiye şandin.

Yekser serî li dezgeheke şewirmendiyê an jî bervedêrekî bide.

Jibo hemî pêvajoya penaberîya te ev zagon e: mafê te ye ku daxwaznameya te bi bladarî di bi çav re derbas bibe û çîroka te bi temamî bê guhdarkirin. Penaberî tiştê tevlihev e. Çi dema pirsên te hebin, pêwîste tu li alîkarî û şîretan bigerî. Li vê derê tu dikarî çend dezgehên destpêkê bibînî.